# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (259):

## Du rêkxirawên/rêxistinên Emrîkî gundine niştecîkirinê yen nimûneyî ava dikin, dijayetiyek li ser malbatekê di malê de, girtinine bêsûcane, şewatek di daristaneke ihracê de
























Piştî şopandin û lêkolînê hate xuyakirin ku du rêxistinên ku li Emrîka rêdankirî (Destê Alîkariyê/Yed El'ewn, Wekhevêtî/Sewasiye) û bi nixumandineke fîxanî tevlî cîbcîkirina pirojeyine niştecîkirinê li Efrînê bûne , bi alîkarî û hevrêzî bi Destlatên Dagîrkeriya Turkiyê û Hikometa Hemahengiya Sûrî - Ixwanî ya Demkî û milîseyên wê re; Û ew kiryar weke pêngavine kûr di guhertina endeza demografî ji herêmeke Kurdî ye dîrokî re têne jimartin, û hebûna pêkhateyeke nijadî ye cîwaz armanc dikin, û bi ser de jî koçbarkirina zorane ya gihîştiyê, û li dawiyê dikeve çarçewa pêkanîna tewanekê li dijî mirovahiyê.

**Ev jî hin heyîn û kiryarên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Dijatiyek li ser malbatekê:**

Îro piştî nîvro, çar çekdarên endamên Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" -yek jê cîranê wî bû- mala Hemwelatî "**Ehmed Mistefa Silêman** /27/sal" (ji xelkê Gundê "Birka" - Navça Mabeta) li Taxa Mehmûdiyê - Bajarê Efrînê basmîş kir, piştî hilkirina deriyê derve, û bi mebesta dijberîkirinê çek kişandinê, û ji ber wê "Silêman" û hevjîn û diya wî reviyan balkona malê, û ji tirsa ku werin kuştin re xwe avêtin kolanê, û ji ber wê bo Nexweşxana Sûrî ya pisporî/eltexesusî hatin rêkirin, û hat xuyakirin ku ling û parsiyên "Silêmên" şikestî ne û govdeyên herdu jinan derizî ne; Ev jî piştî qutkirina "Silêmên" ji şirîta elektirîkê re, ya ji malê ji aliyê cîranê wî ve hatiye dizîn.

Were zanîn ku "Silêman" ji dora sê heyvan ve zorane ji Turkiyê hatiye derkirin, û ji heyvekê ve zewicî ye.

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:**

**-** Li 24.08.2023an. Z, Hemwelatî "**Şiyar Remzî Şêxo** /30/sal" ji xelkê Gundê "Hesendêra" - Navça Bilbilê, piştî vegera wî ji penaberiyê bo cî û warên xwe, û vexwendina wî ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Bilbilê" ve bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê (R.X), û bo Hepsa Maratê ya Navendî li Efrînê hate şandin, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

**-** Li 05.09.2023an. Z, Hemwelatî "**Esmet Mihemed Kor** /48/sal" ji xelkê Gundê "Walîkilî - Meydana" - Navça Reco, bi tuhmeta têkeliyê bi (R.X) a berê re, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

**= Şewatên daristanan:**

"Berevaniya Sivîl li Efrînê" tekez kir ku tîmên/tîpên wê li 03.09.2023an. Z, agirek bi hirşeke nêzîk Gundê "Tetera" - Navça Cindirêsê ketibû (ye ku dora /10/donim dar şewitandî) vemirand, û ji wêneyên bi nûçeyê re hatine belavkirin, komên bermayên êzingên hişk (ên berê bi sedema qutkirina fere ji hirş re) xuya dibin.

**= Rêkxirawa "Destê Alîkar ji bo Fîxan û Geşepêdanê/Yed El'ewn lîl-îxasê we El'tenmiyê - HHRD":**

Li 03.04.2023an. Z, vê rêxistinê li ser rûpela xwe ya Fêsbokê ragihand ku Endezyar "Hîşam El'zayêd - Urdinî ye û rêvebirê pirojeyan e" kevirê bingehîn ê avakirina "**Gundê Destê alîkar yê yekem/Qeryit Yed El'ewn El'ûle - HHRD Village 1**" li "Devera Keferomê li Efrînê" danî, û bê zanîn ku ev gund ji "/250/yekîneyên rûniştinî tevî dûhatan (mizgeftek, cihekî taybet ji bo lîska zarokan, dîkanên bazirganiyê û dibistanekê" pêk tê, û li gor jêdereke xwecihî ew li ser beşek ji erdekî tê avakirin, û ew erd jî bi bergeheke dora/19/hiktaran e, hirşê wê ji aliyê Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" ve hatibû qutkirin, li derbasgeha Rojhilat a Gundê "Keferomê" - Navça Şera û bi /15/KM ji Bajarê Efrînê/aliyê Bakur ve dûr e.

Û wê bi bîr anî jî ku wî kevirê bingehîn ê pirojeyeke din e weke wê û bi heman salixan di bin navê "**Gundê Destê Alîkar yê diwem - HHRD Village 2**" de li "Devera El'xaldiyê li Efrînê" daniye; Û li gor jêdereke xwecihî ku ew gund li ser erdekî nêzîk Gundê "Xalta" - Şêrewa/Çiyayê Lêlûn (ê ku li Rojhilatê Bajarê Efrînê bi /10/ KM û li kêlek Gundên "Kiwêt El'rehme" û "Komelgeha El'berekê" yên niştecîkirinê dikeve) tê avakirin; Bi behaneya ku /500/ malbatên Sûrî yên ziyan di erdheja dawiyê de dîtine û malên xwe wenda kirinê dê sûdê ji herdu pirojeyan werbigrin, û cîbicîkirina herdu pirojeyan gîhaye astine li pêş; Û ew herdu gundên niştecîkirinê yên nimûneyî yên nû ji bo daniştina anîndeyan ji parêzgehên din ên Sûrî tê de ne, û malbatek ji niştecyên resen ên malên xwe di erdhejê de wenda kirine sûdê jê wernagirin.

Rêkxirawa "**Helping Hand Relief and Development - HHRD**" ya Emrîkî xwe bi "Rêxistina Mirovahî ya cîhanî ya ji bo Fîxan û Geşepêdanê (ya ku bi hawara zehmetkêşiyên mirovahî di rewşên awerte û xişim û bêtaran de li hemî çarçewên Cîhanê tê) dide nasîn, li sala 2005an. Z hatiye damezrandin û xwedî bîr û boçûnên Islamî ye, û navnîşana nivîsgeha wê ya serekîn ev e: Wîlayetên Yekgirtî (El'mutehî)/Mîşîgan/Sawsfîld/ 21199 Hillto St Southfield MI 48033.

Were bîranîn jî ku li sala 2022an. Z, li Bakur Rojhilatê Gundê "Keferomê" bi /2/KM, li ser riya Gundê "Elkê" gundekî niştecîkirinê yî nû -ji /360/ malî pêk tê- ji anîndeyan re hate avakirin.

**= Dezgeha Wekhev a xêrxaziyê/ Sewasia Charity Foundation:**

Li 23.08.2023an. Z, vê dezgehê li ser rûpela xwe ya Fêsbokê bi vîdiyo aşkere kir ku kar di avakirina "**Gundê Xwediyên Xwêrxwaziyê/Ehil El'xeyr**" de berdewam e, ji bo daniştina anîndeyan ji parêzgehên din ên Sûrî tê de; Û herweha "**Dezgeha Navdewletî ya Geşepêdana Civakî - SDI**" li 31.8.2023an. Z, li ser rûpela xwe bi wêneyan heman piroje da aşkerekirin, ya ku ew dide cîbicîkirin bi pereyên "Dezgeha Wekhev/Sewasiye".

Ev gundê niştecîkirinê yê nimûneyî ji /13/ avahiyên daniştebûnê yên qateyî (156 perçemalan û bergeha her yekê /55/M çarkoşe) pêk tê, û wê bi binevahiyan, vekirina riyan û mizgeftekê û dibistanekê û dermankirinxanekê û bazareke bazirganiyê û gulîstaneke lîskên zarokan bête xizmetkirin, û asta yekê jê /7/avahî hatine avakirin, ta bi radeya dawîbûnê ne; Û ew li kêlek "Gundê Destê Alîkar ê yekem/Yed El'ewn El'ûle" (ya me li jor çêrê kirî) dikeve.

"Wekhev/Sewasiye" xwe weha dide nasandin: "Rêkxiraweke Emrîkî ye, li sala 2012an. Z hatiye damezrandin, û armanca wê ya serekîn "pêşkêşkirina alîkariyên mirovahî ji deverên zor gerek re, û alîkariya ziyandîtiyên şerê Sûriyê".

Lê Dezgeha Navdewletî ya Geşepêdana Civakî - SDI dibêje ew "rêkxiraweke civaka sivîl" e, li /2015/an. Z bi awakî zagonkirî li Turkiyê hatiye rêdankirin, du navendên wê li Istanbûlê(Başakşehir) û Xazî Entabê hene.

Pirojeyên niştecîkirinê li Efrînê di bin navine fîxaniyê û mirovahiyê de û bi kedên toreyên Rêxistina Birayên Misilman a Cîhanî/Ixwan El'mislimîn û piştgiriya kesayet û Dewletin Erebî û tîmarkirin û rêvebiriya Hikometa Dad û Geşepêdanê/El'edalê we El'tenmiyê ya Turkî berdewam dikin, û ew dikeve nav pilana "**Herêma Erdoxan a Aramkirî**" (ya ku çespandina niştecîkirina anîndeyan ji Parêzgehên din ên Sûriyê û malmewdankirina wan ji xwe re dike armanc), da ku guhertina demografî li dijî hebûna Kurdan li herêma wan fere û kûr bike.

10.09.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

---------------------------

**Wêne:**

**-** Ehmed Mistefa Silêman" ê birîndar.

**-** Şewatek li daristaneke ihracê li nêzîk Gundê "Tetera" - N. Cindirêsê, 03.09.2023. Z.

**-** Qutkirin û jiholêrakirina hirşeke ihracê ye çandiniyê li derbasgeha Rojhilat a G. "Keferomê" - N. Şera.

**-** Gundên "Destê Alîkar ê yekê/Yed El'ewn El'ûle, Destê Alîkar ê dudiyê, Xudiyên xêrxwaziyê/Ehil El'xeyr" ên niştecîkirinê yên nimûneyî.